وبخصوص التمثيل الكردي وإدراج القضية الكردية في المؤتمر يقول إبراهيم أن هذا المؤتمر لن يؤدي للسلام في سوريا فإن حال الشعب الكردي والمناطق الكردية سيبقى مثله مثل باقي المناطق السورية، هذا بغض النظر عن التطورات التي ستحدث حسب ما هو مرسوم ومخطط من قبل مراكز القرار الدولي، وعلى ذلك فإننا لا نتوقع أن تكون هناك تطورات جديدة على الصعيد الكردي ، هذا سواء كان التمثيل بعضو واحد، أو أكثر.
ويضيف في نهاية حديثة أن وجود عضو واحد فقط ضمن هذا الوفد هو تقليل من شأن ووزن وحجم القضية والتمثيل الكردي في سوريا، بل إنها حركة تجميلية في مظهر الوفد، والذي سيظهر مشوهاً في حال عدم وجود أي ممثل كردي لأن المجلس هو جزء من الائتلاف.
ويرى الكاتب والناشط السياسي سلمان بارودو أن الأزمة السورية أصبحت الشغل الشاغل ومحطّ اهتمام العالم أجمع، وخاصة مع مع اقتراب مباحثات جنيف٤ حول سوريا، وهناك تداخلات دولية وإقليمية متعددة وعميقة، فكل طرف يسعى أن يكون الوفد وفق أجنداته وأقرب إلى مصالحه وتصوراته، لذلك، أن ظروف انعقاد مباحثات جنيف٤ بالنسبة لجميع المعنيين، ليست سهلة بالنسبة للحل السياسي في سوريا، وبنفس الوقت ليست صعبة أيضاً، خاصة كتوافق الجميع على الحل السياسي.
ويشير بارودو أنه من أجل إنجاح التمثيل الكردي في المباحثات لا بد أن تكون المشاركة تشمل جميع الأطر الكردية الفاعلة على أرض الواقع، وبوفد كردي موحد، ولديهم مشروع متفق من قبل أغلبية الأطر السياسية الكردية.
ويؤكّد بأن القضية الكردية ستكون في مباحثات جنيف٤ محط نقاش وتداول، ولا يمكن القفز عليها، منوّهاً أنه إذا لم يكن هناك وفد كردي مشترك يمثل الجميع باعتقادي سيكون وقعه وتأثيره في المباحثات دون المأمول.

bûyer PRESS

Nûçe... Bi Zelalî

Rêvebirê Giştî: Ehmed Bavê Alan Serokê Desteya Sernivîsê: Qadir Egîd Têkiliyên Giştî: Kewser Reşîd

www.buyerpress.com buyerpress buyerpress1 buyerpresss@gmail.com Whats App00963992238683

Rojnameyek Siyasî- Civakî- Çandî- Serbixwe-Nîvmehane

3

Hejmar /59/ 15.2.2017 Buhayî PS 50

Mele Nûriyê Hesarî
2011 1934-

Mele Nûriyê Hesarî, di 1934'an de li Hesar a gundê Kercewsê jidayik bûye. Di nava Kurdan de bi nasnavê Seydayê Pirêşan tê naskirin. Navê diya wî Xanimê ye, navê bavê wî Mele Yûsifê kurê Emer e. Emer ji gundê Hêştirekê ji malbata Etmanka, ji şaxê Elikan, ji rema Hevêrkan bûye.

Mele Nûrî ji malbateke xweneda, zana û bîrewer hatiye. Mele Nûrî di 1939`an de pêşî li cem diya xwe dest bi xwendina Quranê kiriye û li cem wê Mewlûd, Nehculenam, Nûbihar û Rewdneîm xwendine. Di 1940`î de, çaxê ku diya wî li Hesarê giyana xwe spartiye Xwedê, îcar wî li ba kekê xwe Mele Hiseyn xwendiye. Lê çaxê ku kekê wî çûye leşkeriyê, îcar bavê wî ew xistiye dibistana bi zimanê tirkî ya ku li Hesarê bûye.

Mele Nûrî di jiyê xwe yê bîstî de (1954) dest bi nivîsandina bi zimanê kurdî kiriye û berhemên xwe hemû bi alfabeya latênî nivîsandine. Digel wê perîşanî, dilêşanî û xizantiya xwe de deh pirtûk kirine malê Pirtûkxaneya Kurdistanê

pirtûka Mele Nûrî ya bi navê Hostanîbêja Zarhaweyên Kurdî berhema wî ya pêşî bû ku di 1996'an de li Swêdê ji aliyê weşanxaneya PENCINARê ve hatiye çapkirin.

Ji berhemên wî:

- Şoreşa Barzanî: Helbest, 1995
- Axlîma: Pêlên: Helbesta Kurdî, 1996
- Rêziman: Destnivîs
- Ferhenga Kurdî–Kurdî: Destnivîs
- Ferhenga Kurdî – Tirkî: Destnivîs
- Ferhenga Kurmancî- Zazî: Destnivîs
- Mewlida Pêxember: Destnivîs
- Vegerandina Zimanê Erebî Şarvîn: Destnivîs
- Koledar: Çîrokek Helbestî ye, Destnivîs
- Dû Mar: Çîrokek Helbestî ye, Destnivîs, Bi zimanê Erebî ye.
- 11 Dîwanên Helbestan: Destnivîs
- Bîranîn, ji jiyana wî: Destnivîs

Her wiha rehmetiyê Mele Nûrî hin xelat jî standine wek Xelata Festîvala Helbesta Kurdî, Xelatek ji Koma Narîn a folklorî.. Helbestvan Mele Nûrî Hesarî di 25.1.2011an de li mala xwe li bajarê Qamişlo koça dawî kir, û li goristana Qedûr beg hate veşartin..



www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Milletê Facebookê

Çend rojin dî em ê şeş salan ji temenê şoreşa Sûriyê derbas bikin, ev şoreşa ku me xwe tê de beşek sereke û aştîyane didît. Gelo em rojekê li xwe vegeriyane, ka di ewqas roj de me çi kir, me çi qezenc kir û em ketine çiqas şaşitîyan de. ji wan tiştên ku me çavê xwe jê girtiye û paşguh kiriye malpera Facebookê ye .

Berî Buhara Erebî destpê bike û biteqe, Internet li Sûriyê hebû, lê pir giran bû. Me di riya telefonên "Erdî" re bikar dianî, û yên ku bikar dianîn, pirrê wan siysetmedarên ku rewşa siyasî ya li welêt dişopandin bûn, û daxuyanî li ser malprên Kurdî belav dikirin, herweha nivîskarên ku gotarê xwe li ser gelek malperan diweşandin, çi Kurdî û çi Erebî. tevlî vê yekê jî rêjîmê piranîya malperan digirtin û qedexe û kontrol dikirin.

Di wê demê de Facebook li gel me wek malperek nû, ketibû asîmanê ilktronî de, lê tu kesî ji gelek sedeman guh nedida wê, yek ji wan ku rêjîmê ew xilqandibû û li deverên me venedibû, û ya din jî ne cihê gotar û helbest û daxuyaniyan bû . Tenê cihê wêneya bû . û ji xwe xwedanê wê ji ber ku ji yekê hez dikir wêneyê wê û yê yeka din peya dikir li ser rûpela xwe li zanîngehê, û ji hevalên xwe dixwest ku li ser wêneya vê keça xweşikok "LIKE" bitekînin..

Bi rojan û mehan ev malper di nav xwendevanên Ermrîka bû cihê wêneyên kesê ku di vê malperê de cihê xwe girtibû . Lê ne cihê siyasetmedar yan rewşenbîran bû .

Buhara Erebî ji welatê Tûnis destpê kir, di pey re li Misir, ku milletê wê pirrê wan Facebooka wan hebû, û girûpên taybet li ser çêkirbûn, dan û standin di navber tevan de çêdibû, ku çawa û kengî dakevin kolanan. Wan baş di rêya van grûpan re sûd jê girt. Me rewşa şoreşên van welatan di rêya Televîzyonan, û car caran di rêya Facbookê re jî dişopand.

Rêjîmê fam kir ku berê şoreşê li cem e . Lê ev malper hîn jî ji aliyê desthilarê xilqandîbû, û bi zehmetî divebû . Tirêna şoreşê berê xwe da Sûrî. Tiştê yekem rêjîm kir ku ev malper serbest kir, û xilqa wê li ber me tevan vekir .

Her çar mirov di vê malperê de, di Sûriyê de bûn xwedî navek,. yê şoreşgêr bi navin biyan, û ne wêneya xwe tê de karê xwe berdewam kir . Mirovên sivîl tenê hemû tişt dişopand lê bê deng û qerebalix, ji tirsa ku rêjîm wî bigre.

Salek, dido, sisê.. û ta niha em ê bikevin sala 7an de, hîn jî şoreş berdewam e, û hîn jî em li Facbookê vedigerin û nûçeyên nû jê werdigrin. ya giringtir ku ew ketiye cihê ewqas malperên Kurdî û Erebî de, ku tu kes ji me nema li wan malperan vedigere û ew jibîr kirine.

Dema tu Facbookê vedikî, tê bibînî ku yekî sitranek M. Arif belav kiriye, posta bi dû de keçekê behsa kulîlka Yasemîna Şamê kiriye, ya di pey re, çalakvanek Kurd bi tûjbûn tevgera siyasî a kurdî rexne kiriye, ya din tê pêrgî daxuyaniyek siyasî bibe, dibe tu pêrgî wêneyê keçeke Kurd ku wêneyê Kutilka girtiye belav kiriye, di pey re tê mirîdekî serok Barzanî li ser camêriya wî nivîsiye, û yê din li ser birêz Ocalan nivîsiye û pesnê felsefa wî daye. "Çavê min birje" pirrê xortan û keçan di riya Facbookê re bûne helbesvan, ya xerabtir ew e ku nîvê nivîsan jî yên diziyê ne. Tu dadikevî, tu di rûpela xwe de pêrgî rewşenbîrekî ku doza yekîtiya Kurdan dike dibî.

Halbik çi bi serê me de hatiye? Yekemîn.. Vê malperê serê me ji pirtûkan rakiriye, ku berê wek şûşa lempê bi ser pirtûkan de bû, çavê me xistiye vê mirêka şîn, û em bûne dîlê vê malperê. Diwemîn.. Ne tenê xort û yan keç, lê belê ev şewba Facbookê li nav me tevan belav bûye.

Sêyemîn.. Hevalê ku bi hev re ne bi roj û şev, ji hev re dibêjin "Ma te nexwend min çi li ser rûpela xwe belav kiriye!! û di

Ehmedê Mûsê

xwe re nabîne nerîna xwe jê re bêje !!!!

Berî nêzî deh salan xwediyê Maykrosoft got: Ta ji min bê ez ê pelan rakim û dewsa wê bikim Intirnet, lê negot li ku ez ê willo bikim !! ya ku bala min dikşîne ku Facbook li nav milletê Ewropa yan Emrîka, pirr kêm vedibe, û hîn jî serê van milletê pêşketî di pirtûkan de ye ..!

Siyaseta Kurdî Di Navbera Avakirina Dewletê û Helweşandina Civakê De

Li ser têgeha "Siyast"ê re Ocelan dibêje: "Eger erkê exlaq encamdana karên çarenivîdar bi başî be, erkê siyasetê dîtina karên baş e". çawa perwerde li xêzanê de berpirsê yekê ji avakirina mirov wisa siyaset jî corekî perwerdê ye, ji ber ew li her dezgehekî de cih digire û berpirs e ji çawaniya rêvebirinê. Em dikarin wisa siyasetê bi tevgera rêvebirinê ve girêbidin ku siyaset tîn (energy) e li rêvbirinê de, siyaseta çalak derencam dibe rêvebirina çalak… ev çend e li ser rêvebirina nerm, baş, xerab û berhemdar jî rast e.

Mirov ji komeke pirensîpan pêk tê, dema komeka mirovan hevbeş dibin li hilgirtina çend pirensîpan de civakekê diafirînin. Civaka kurdî ku li xwe de dabeş bûye bi ser çend civakan de ji encama fakterên cuda weke nebûna dewletê û dabeşbûna wan bi ser çend welatên cuda de. îro rûberûy helweşanê dibe, sedem jî siyaseta kurdî ye. berî em zelal bikin derencama çaverêkirî ji vê siyasetê divê em ruhniyê bidin xaleke giring ku ew jî: Ji ber mirov li pêkahateya xwe ya derûnî û eqlî de ji hev cuda ne li gel pêkhateya laşî hebûna cudahiyê tiştekî xwezayî ye, û pir normal e her mirovek cuda ji yê dî hizra xwe bike, û ew hizir rêkeke cuda jê re veke. Ev cudabûn sedeme li her cihekî ji cîhanê û her heyamekî ji dem û dîrokê aliyên ji hev cuda hene li her biwarekî de be.

Siyaseta kurdî û avakirina dewletê:

Hebûna dewlata kurdî zêdetir ji mafekî netewî mafekî mirovî ye, da kurd di çarçoveya wê dewletê de nirx û behayên xwe biparêzin bi taybetî piştî ku welatên Turkiya, Sûriya, Iraq û Îran siyaseta nehiştin û qirkirinê dijî kurdan bikaranî/ bikartînin. Bi saya keda xort û keçên kurd û xwîna şehîdan bi dirêjahiya dehên salan kêm be zêde be kurdan karî xwe ji cîhanê re bidin nîşandan ku ew jî xwedî giranî û hêz û bandor in, ev ked û xebat bûn egerê wê çandê ku îro Başûrê Kurdistanê nîvdewletek be, li Rojavayê Kurdistanê rêveberiyek were damezirandin û li Bakûrê Kurdistanê kurd bibin xwedî perlemanter, partî û dezgeh. Helbete ew keddayîn li bin dirûşma serxwebûna kurdistanê de ye bi awayekî rasterast yan ne rasterast be. Ji vê yekê em karin derxînin ku vîn û tevger bo avakirina dewleta kurdî heye û berdewam e. Lê pirsa herî giring ew e ka avakirina dewletê metirsiyê ji ser kurdan radike?!

Berî bersivdana vê pirsê em ê biçine mijareke dî

Siyaseta kurdî û helweşandina civaka kurdî:

Li Rohelata Navîn heta nuhe li partiyên siyasî de giyanê eşîrtî û mezhebî û navçeyî cihek mezin girtiye û gelek caran li axaftinên partiyan de diyar dibe ku ew bi xurtî girêdayî navçeyek, eşîretek yan mezhebekî diyarkirî ne, herçiqas xwe li kerasê Secularism ê de nîşan didin. partiyên kurdî jî tevî dirûşmên Kurd û Kurdistan nikarîne serederiyê bi hemû kurdan re bikin bi heman hizir û reftarê. Eger em Başûrê Kurdistan weke mînak werbigirin, li Duhok ji zarokekî yan kalekî yan şûfêrekî teksiyê re behsê siyasetê bikî wê bêje Duhok navçeyeke zer e, li Silêmanî wê bêjin kesk e, hizra me – weke xelkê başûr - beramber bakûrê Kurdistanê ew ku PKK bakûr e. eger em li medyaya kurdî jî guhdar bin ev cudahî û cudahîkirin weke rojê diyar e. ev pirs ne tenê ew e ku devera Behdînan li pey PDKê ye û devera Soran li destê YNKê de ye, belku gehaye wê radeyî ku dijberiyek li navbera herdu

Jaffer Joqy

deveran de heye, sedema vê çendê jî ev e:

Gostaf Lobon dibêje: Cemawer li serûberekî neheş de ye, tak dema derbasî nav cemawer dibe dikare her tiştî bike ku jê nedihate çaverêkirin, gotina wî kesê ku cemawer jê re siloganan bilind dike bandoreke xwe ya xurû (absolute) heye, ew dibêje û cemawer cêbecî dike rasterast. Takê kurd ketiya rewşa neheşiyê (Subconscious) loma serokê partiya xwe dike xwedawendek û her gotineke wî cihê pîroziyê ye û nabe gotûbêj li ser were kirin. Siyaseteke wêranker li aliyekî û takekî neheş li aliyekî din teqez wê derencam helweşanek be. Ji xwe em nuhe li dema helweşanê de ne, şopandina mediya û sosiyalmediya bes e ji bo piştrastkirina helweşiyana civaka kurdî.

Îro pirsgirêka li navbera vê partiyê û wê partiyê de masên siyasî derbas kirine û ketine nav xêzanê, nav ragehandinê, nav helbest û stranê de û helbet bi berdewambûna vê rewşê re wê dewleta kurdî ti pirsgirêkê çareser neke. Ji bo takê kurd cudahî nîne ka li zîndaneke Kurdî de be yan Turkî, Ereb azadiya wî qedexe bikin yan Kurd, Faris wî sêdare bikin yan Kurd; rewşa zîndanê bi guhertina nav û cihê zîndanê re naguhere.

Tirkiye û Qeyrana Hindurîn

Tirkiye bi hovîtiya xwe dixwaze ji qeyrana hindurîn bireve û hebûna xwe bi vî pergalê sedsalî ve berdewam bike.

Bi qasî xwendina me ji pêvajoya dîrokê re, diyar dibe ku her çend salan dewletên sermaydar pergala sîstema xwe li gor mercên ekonomî û tevgera civaka sosyal xwe diguherinin bi taybet di serwextên ew têkevin nava qeyranan de, qeyrana sereke di girîngbûyîna peydakirina alternatîvan heye, xala sereke jî kirîzeyên aborî ne.

Dema ekonomiya wan dewletên serwer dikeve bivekê, yan senyalên tirsnak wekî hoyîbûna diravî û bilindbûna asta xwestekên gel ji bo çareserkirina pirsên teknolojî, siyasî, çandî û ekonomî, ew neçar dimînin ku berê xwe bidin alavên veguherînê di sîstema rêveberiya xwe de.

Di vê derbarê de hemû sazî û rêxistinên nepenî û ewleheyê dikevin dorê û hemû bi hev re li çareseriyê digerin, di vê qûnaxê de ew hemû belgeyan bikar tînin, ango raportên wekî belge ji xwe re dikin alava herî guncaw di lêgerîna bersiva qeyranê de, ev yeka di bûyerê 11-10-2001an diyan bûn, heger bûyer ne pilankirîba jî, lê kete bin xizmeta siyaseta pingava ji nû ve avakirin û şopandina rêbazek nûh di cîhana gilobalîzmê de.

Em hemû agehdar in ji kiryar û veguherînên piştî bûyerên Siptemberê, ha li vir diyar dibe ku ew xebata desthilatdariya kevneşop di rêveberiya welatên li Rojhilata Navîn, nema bi têrê dike û pêdawistiya wan bi veguherînê heye, me jî dît ka çawa pilan hatin amadekirin û berê şer veguhezî qadên desthilatên totalîtar, ji Efganistanê ta şerê niha li Sûriye dibe.

Diyar dibe ku hemû desthilatdarên Rojhilata Navîn wê bikevin nava veguherî û gorankariya sîstema desthilatdariyê, wekî libê tizbehan ew sîstemên diktator têne hilweşandin, dewleta Tirk jî xweşik dizane ku desthilatdariya wê bi vî şêweyê tundrew nema wî diparêze, ji ber destekdayîna wê ji hevbendiya Etlesî werdigirt ji bo şerê Sûveyeta berê qediya, nema pêwistiya dewletên Ewropî û Emrîka bi destekdayîna rijêma Tirk heye.

Dosya sereke di destê hezên kuwalisyona navnetewî li dijî Tirkan, doza mafê mirov û pirsa demokrasiyê û kêşeya kurdî ye, ji ber ku rijêmên diktator nikarin bi hêsanî guherînê têxin rêverî û sîstema dewletiyê, lewre ew belge bi têrê dikin da li dijî dewleta Tirk werin xebitandin.

Dewleta Tirk nekarî deriyê Ewropa ji xwe re veke û nekarî pirsên xwe ên hindurîn çareser bike, ji lew ketiye qeyranek navxweyî û wekî mirovê ji hişê xwe bikeve, roj bi roj berê xwe dide kiryarên hovane û desteka xwe ji bo hêzên wekî kedîkirina Daiş û mafya Fethulah Gulen, vêca da ku destekdayînê ji cîhana misilman bigre, em dibînin ku hêstirên xwe ji bo Filestîniyan li dijî Israîl

Melevan Resûl

dibarîne, û ji rexê din ve rijêmên mîrnişîn û tundrew li xwe kom dike û gotara nijarperistî û olî û regezî dide pêş.

Tirkiye wekî Sûriye û wekî hemû dewletên dagirkerên Kurdistanê bi şêweyekî hevbeş li dijî doza kurdî dixebitin û di nava welatên xwe de binpêkirin û perçiqandina mafan heye.

Vêce da ku rijêma xwe biparêze, me dît çawa di bin navê şoreşa Sûriye de, wê çiqas rûxandin û ji hevbelakirina Sûrî kir, di encamê de ew kesên bi navê opzisyonê bi erzanî di bazarekî bi rijêma Sûriye û Rûsiya firotin, ji bilî wêranî û koçberiyê, gelo dewleta Tirk çi xizmet ji bo miletên Sûriye qizinc kir.

Bê guman dema wê hatiye ku rijîma Tirk û neqşeya dewletê were guherîn, ew bi rêbazek hişmend dikare destên ji derve dûrî xwe bike, ew jî çareserkirina qeyranên hindurîne û miletên li Tirkiye jiyan dikin, wan bi ser xwe ve bikşîne û dest bi gurzek guherînên bingihîn bike û di serî de pirsa kurdî, heger wa neke sedî sed wê rewşa wê di dahatûyê de ne gelek ji rewşa Sûriye û Êraqê baştir be.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Ebdullah Ocelan Serokê Partiya Karkerên Kurdistan"PKK"



Dema ku mirov bi awayekî hûr û kûr li kesayet û şêwazê jiyana rêber APO dinêre, mirov dibîne ku her ji zarokatiya xwe ve di nava têkoşînekî gelekî mezin de bûye. Rast e, her mirovek dema ku ji dayîk dibe, bi awayekî wekhev(biyolojîk) tê dinyayê. Ji ber ku ev bûyerekî asayî ye, ango hemû mirovahî bi vî şêwazî çavên xwe li dinyayê vekirî ne, dibe ku weke hikmekî giştî bê pejirandin. Lê belê, jiyana mirovan, şêwazê wî/wê, hal û rewşa ku tê de û lêgerîn, wî kesî ji mirovên din cuda dike û dibe wesîle ku ew mirov di nava jiyana mirovahiyê de bibe xwedî şûngehekî cihê.

Li ser vî bingehî jiyana Rêber APO, şêwazê têkoşîna wî û kesayeta ku avakirî bû wesîle ku bibe rêber î gelekê. Weke mînak, gelek rêber hene ku tenê rêber tiya netewa xwe an jî partî û dewleta xwe dikin. Lê belê kesayetekî weke rêber APO jî heye ku tenê bi rêbertiya partiya xwe, gelê xwe û civaka xwe re bisînor namîne, rêbertiya hemû mirovahiyê jî dike.

Tê zanîn ku Rêber APO di malbatekî hejar de hatiye dinyayê, malbata Wî weke ku bixwe jî tîne ziman, malbateke ku bikaribe gelek tiştan bide zarokên xwe nebûye. Di nava civaka gund de jiyana xwe domandine û hewl dane ku zarokên xwe jî di vê çarçoveyê de mezin bikin. Lê belê, tişta ku rêber Apo ji zarokên din ên gund cuda dike ew e ku hê di temenê xwe yê zarokatiyê de ketiye nava lêgerînan ku jiyana heyî nepejirîne û li hemberî vê yekê raweste. Her weke ku di bîranînên xwe de jî amaje pê dike, di serî de li hemberî paşverûtiyan serê xwe radike, ango bi neyarên malbata xwe re dayîn û standinên xwe hene, ji wê malbatê hevalên xwe yên herî hêja hene(Hesen Bîndal).

Di vir de li hemberî bêwatebûna van paşverûtiyan berxwedanek heye. Her wiha hê di wê demê de li hemberî kolekirin û desteserkirina jinê nerazîbûnekî mezin û aciziyekê di dilê xwe de dihewîne. Di civakekî bi vî rengî de seknekî wiha raberkirina zarokekê, hema hema negengaz e.

Di dema çûyîna dibistanê de ketina ferqa qirkirin û asîmîlasyonê, mirov dikare bibêje ku ti zarokek nikare di mejiyê xwe de hîs bike. Lê belê tişta ku rêber Apo kir lêgerînvanekî heqîqetê yê herî xurt, ev xislet bû ku kiriye rêber Apo bibe rêberekî mirovahiyê.

Roja 4'ê Nîsanê rojekî wer ji rêzê nîn e, ji ber ku gelek hêman hene ku bi vê rojê ve girêdayî ne. Di rêza pêşî ya van hêmanan de Têkoşîna Azadiya Jinê tê. Ji lewra, rêber Apo têkoşîna azadiya jinê kiriye bingehê têkoşîna mirovahiyê. Bi taybet têkoşîna azadiya jinê her ji zarokatiya xwe ve ji xwe re kire bingehê têkoşînê û wer jî meşiya. Dema ku mirov dahûrandinên rêber Apo yên li ser jinê û azadiya wê dinêre, dibîne ku lêgerîna xwe ya heqîqetê ji reh û rîşeyên civakê daye destpêkirin, ji lewra jin jî weke hêmana sereke ya vê civakbûnê ye. Ji ber vê ye ku roja 4'ê Nîsanê di heman demê de roja dayîkbûna têkoşîna azadiya jina ku hati kolekirin e û bi taybet roja jina Kurd e ku di vê rojê de hatiye dinyayê û çavên xwe bi şewqa rêber Apo rohnî kiriye. Her wiha roja ji dayîkbûna civaka Kurd e ku ev civak ji xwe direviya, hatibû kolekirin, ji hestên xwe yên netewî dûrketibû, ketibû bin çerxên qirkirinê û wer lê hatibû ku nedizanî ku Kurd e.

Zayîna yekem ya rêber Apo, ji ber vê yekê di serî de ya civaka Kurd, zayîna hemû mirovahiyê ye. Ango zayîna rêber Apo nabe ku tenê bi hatina dinyayê re bê sînordarkirin. Ji ber ku roja Ji Dayîkbûna Rêber Apo tenê ji dayîkbûna şexsekê nîn e. Bi hatina dinyayê ya rêber Apo re, di serî de civaka Kurd û jina Kurd, hemû mirovahî hatiye dinyayê û bi vê re jî hemû mirovahî bûye xwedî wî şensî ku bikare di rêka heqîqetê de bi rêber Apo re bimeşe.

Ev jî tê wê wateyê ku roja 4'ê Nîsanê roja jidayîkbûna hemû mirovahiyê ye û divê hemû mirovahî vê rojê weke roja jidayîkbûna xwe pîroz bike.

Rêber Apo ti caran jidayîkbûn tenê weke mijarekî biyolojîk nenirxand. Ango hatina dinyayê pîroz dît, lê belê hatina dinyayekî wiha ku di nava çerxên modernîteya Kapîtalîst ku roja 4'ê Nîsanê roja vê ye, divê hemû mirovahî li hemberî Modernîteya Kapîtalîst têbikoşe û xeta Modernîteya Demokratîk bihêz bike da ku bikare vê roja jidayîkbûnê bike wesîle ku di vê dinyayê de bi awayekî azad bijî. rêber Apo ku her ji zaroktiya xwe ev hêvênê mirovahî û heqîqetê di xwe de ragirtiye, ji bo ku di serî de gelê Kurd û gelên Rojhilata Navîn, hemû mirovahî jê sûd wergire, pêşengatiya vê yekê dike û hemû têkoşîn û berxwedaniya wî ya li Îmraliyê jî li ser vî bingehî ye.

Ebdullah Ocalan.. Jînenîgarî

Qonaxa Zaroktiyê:

Ebdullah Ocalan, di 1949'an de li gundê Amara yê navçeya Riha Xelfetiyê ji dayik bû ye. Dibistana seretayî li Cîbînê xwend û hê di wê demê de di lîstik, limêj û parvekirinê de pêşengî dikir. Dibistana navîn li Enqerê qedand. Di 1969'an de li Amedê dest bi karmendiyê kir. Di karmendiya salekê de têkiliya dewlet û civakê û ya sazî û man feodal û dewletê ji nêz ve dît. Di 1971ê de vebuhandina xwe deranî Stenbolê û li wir di ber karmendiyê de xwe amade dikir ku bikeve zanîngehê jî. Heman sal qediya xwe li zanîngeha dadê çê kir û dev ji karmendiyê berda.

Jiyana Ramyarî:

Di wan salan de Ocalan kete bin bandora bayê 1968'an de û Marksîzm - Lenînîzm nas kir. Ew salana weke salên werçerxa jiyana wî ne û her wiha ew Sosyalîzm, yeksanî û azadî pir nêzîkî xewnayên xwe yên zarokatiyê dîtin. Ocalan wî li Qizildereyê hatin kuştin û vê bûyerê şopên kûr di jiyan û ramanên wî de hiştin. Di 7'ê Nîsanê de hat binçavkirin û şandin girtîgeha Mamakê. 7 meh di girtîgehê de ma û di wê pêvajoyê de xwe gihand ramana wî ava kirina rêxistinekê û ji bo vê yekê gav avêt nav pêvajoyeke din a lêgerîn û lêkolînê. Piştî 1972'an pirsgirêka kurd bi bimeşîne.

Avakirina PKK:

Di 27'ê mijdara 1978'an de jî Ocalan û hevalên xwe biryara avakirina Partiya Karkerên Kurdistanê didin. Xebatên rêxistinkirinê yên Ocalan û Partiya wî PKK yên li Kurdistanê di demeke kin de bala dewleta tirk kişand. Li ser vê şêweya nû ya Ocalan a li hemberî pirsgirêka kurd ku zikê nerm ê Tirkiyê bû, dewleta tirk zextên xwe zêde kirin. Dewletê bi awayekî vekirî li hemberî awa Ocalan şer dida destpêkkirin û ji ber vê yekê Ocalan di 1979'an de derket derve û çû Libnanê. Bi vî awayî meşa ku wê 20 salan li Rojhilata Navîn berdewam bikira, destpê kir. PKKê li Libnanê di 1982an de kongira xwe ya duyem pêk anî û biryara vegera nava axa welat wergirt. Milîtanên PKKê di bin pêşengiya Ocalan de perwerdehiya xwe ya îdeolojîk û leşkerî jî qedandkirî bûn. Di encamê de di 15ê tebaxa 1984'an de li Bakurê Kurdistanê şerê çekdarî destpêk kir.

Girtina wî:

Di encama şerê çekdarî de li ser daxwazên ku ji Tirkiyê tên, ji 1993an û şûn ve PKKê 3 caran agirbest danezan kir. Ev gavên ku ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd hatin avêtin, rastî pênûs û astengiyên derûdorên rentxwir hatin. Di 9ê Cotmeha 1998an de di encama hevanîyeke ku bi hevkariya hêzên navnetewî hat amadekirin, Ocalan neçar ma ku ji Suriyê derkeve. 9ê Cotmehê de Ocalan dema dest bi rêwîtiya ber bi Ewrûpa kir wê wiha bigota: Ez ji niha û şûn ve dixwazim rola xwe di kanala siyasî de bilîzim. Ocalan dema li Îtalya bû gelek caran bangên ji bo aştiyê kirin lê belê ji Yekîtiya Ewrûpa hêviya ku dikir bi dest nexist. Ocalan di 2yê sibata 1999an de bi zordayîna Yewnanîstanê heta Kenyayê diçe. Di 15ê sibata heman salê de jî li paytextê Kenya Nayrobiyê li pêşiya avahiya sefaretxana Yûnanîstanê bi hevanîyeke navnetewî ber bi Tirkiyê ve tê revandin. Serokê giştî yê PKKê Ebdullah Ocalan li girava Îmralî ya li nav derya Marmarayê bi tenê li serê xwe di girtîgehê de hat bi cîhkirin. Ocalan li Îmraliyê bi parêznameya xwe ya pêşî de daxwaz kir ku pirsgirêka kurd li ser bingeha aştiyê were çareserkirin.

Egîd Nûman



www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Nexşeya Kurdistanê li vî bajarokî tê dîtin

Dema mirov dikeve axa Şengalê yekser ew dîmenên jin, zarok, kal û pîr li pey hev dimeşiyan û berê xwe dabûn Rojava , ew korîdora mirovahiyê ku dused hezar Êzîdî tê de ji destê çeteyên hov yê dijminê mirovahiyê hatibûn rizgarkirin.

Di bîra her kesî de wek mîxekî pola hatiye çandin her di bala mirovan de ye. Gundê bala min kişandî bajarokê Xanesorê ye, ku di kolana wê ya sereke de, li her aliyê rêyê bi dehan wêne daliqandine. Dema me pirs kir, şêniyên gund gotin, 'ev şehîdên ku nehiştin koka Êzîdxanê ji rûyê dinyayê rabe, wan kesan xwe ji me re kirin mertal heta em û zarokên me bi silametî xwe xelas bikin.'

Kolan derdora 1 km dirêj e. Em tê de meşiyan, dema ku me bala xwe da navên gund û bajarên şehîdan ji Kobanê bigire heya Efrîn, Qamişlo, Amed, Wan, Dêrsim, Mako, Mehabad hwd. tê de hebûn. Te digot qey neqşeya Kurdistan li pêş te ye û tu dixwînî. Di şexsê van şehîdan de Kurdistan li Şengalê kom bû.

Bajarokê Xanesor gundek nû hatiye avakirin li deşta Qeraxê çiyayê Şengalê. Rêjîma Seddam Hisên di salên 1975'an de ava kiriye. Bi navê "tecemuh" ango kombûn ew jî pîlaneke dijî Êzîdiyan pêk hat, da ku ji çiya dakevin û bikevin bin kontrola rejîma Baas. Ew gundên li ser çiyayê Şengalê vala kirine û hemû li gundên nû bi cih kirin e. Bêhtirî bîst tecemuh ava kirine, bajarokê Xanesor yek ji wan e. Nifûsa bajarokê Xanasorê berî fermanê derdora 35 hezar kesî bûye. Dema ku em di nav bajarok re meşîn avahiyên nû hatî lêkirin hebûn. Piraniya avahiyan bi rengekî gulover hatibûn avakirin. Ew jî xwediyê malan dixwestin heta avahiyên xwe wek rojê ava bikin. Wekî tê zanîn li gel Êzîdiyan roj pîroz e. Niha jî xelkê xwe piştî aramî û saziyên xizmetê hatin avakirin hêdî hêdî vedigerin ser warê xwe.

Şengal - ANF/ Heysem Mislim

Dem û Hebûn Dengê Jîyana Têkçûyî

Ebas Mûsa

Di filmê "Dem û Hebûn"ê yê derhîner û senaryonivîsê Kurd Firat Yavuz de, qelebalixa bajarekî mezin ê mîna Stenbolê li ber guhên me dikeve. Stenbol wekî beroşeke mezin mirovan di nava xwe de hiltîne û wan dikelîne û dikelîne heta wan dibişêve û di dawiyê de rengê xwe bi ser wan de dirijîne.

Qehremanê film ajovanekî ji bajarê Amedê ye. Nîşana bajarê wî jî wêneyekî Ameda dîrokî ye ku di hundirê otombîla wî de ye û her wisa neqişa Şahmaranê ya ku bi neynika otombîlê ve hilawistî ye û her dihejhije. Ajovanê Amedî taksiya xwe di nava lehiya Setnbolê û qelebalixa bêhempa de diajo. Xanimeke ciwan pê re siwar dibe. Dema ji bo leza xwegihandinê ronahiya sor a trafîkê derbas dike, hema ji nişka ve ew xanima ciwan dienire, jê dixwaze ku wê peya bike û bi dengekî qube dibêje: "Hûn tev de wekî hev in!" Mebesta xanimê Kurdbûna ajovan e, nemaze piştî şerê Amedê yê di navbera hikûmetê û Kurdan de (paşê dema ajovan li radyoyê guhdar dike, ev tişt eşkere dibe).

Karakter û kesayetiya ajovan wekî nimûneyeke Kurdên Kurdistana Bakurî dixuye, nemaze dema ew bûyer pê re diqewime ku şikestin û têkçûna civaka Kurdî ya li bajarên mezin ên Tirkîyeyê berbiçav dibe; kesayetiyeke rût, şilfîtazî, bêhêvî, bênasname û bêdeng.

Di nava wê danûstandina tûj a ku kesayetiya ajovan tê re derbas dibe de, çend kes destê xwe jê re dihildin, lê xayîzî û kela nava ajovan nahêle ku li tu kesî raweste. Di wan rêyên dirêj û biqelebalix re pîremêrek destê xwe jê re hildide. Ajovan jê derbas dibe û paşê lê vedigere.

Pîremêrê siwar nabêje dê ber bi ku derê ve biçe, lê mercekî dide ber ajovan; merc jî ew e ku ew ê kilamekê jê re bibêje: Heger kêfa ajovan jê re hat dê tu pereyan ji dest wî negire, lê heger ne xweş be ew ê hemû pereyên di berîka xwe de radestî wî bike.

Kalemêr dest bi kilamê dike. Naveroka kilama wî jî derbarê xerîbiyê de ye û peyama hebûn û nebûnê, nasname û windabûnê di nava xwe de tîne ziman. Kilama kalmêrê siwar mîna derd û kulên ajovan ên ku di dîmenên wî de xuya dikin dûvûdirêj e.

Kilam û Jîyana Kurdî:

Di Filmê "Dem û Hebûn"ê de, navnîşan pir eşkere ye û nahêle bîner zêde lê bigere, lê helbet ew bêdengiya ajovan dê bihêle sireke cemidî te bigire, dê bihêle tu nasnameya xwe li ber çavên xwe daynî û pirsên hebûn û nebûnê jê bikî. Kilama "Siwaro" mîna hespekî beza radihêje hest, raman, jîyan, bawerî û şikestinên kesayetiya ajovan. Ew hespê beza jî xewna dûr û dirêj e ya ku radihêje biyaniyê û te diavêje ber bi bajarê te ve, ber bi welatê te, ax û hebûna te ve.

Peyama film wateya berîkirina cih û war di rêya kilaman re dide, çi ku herî zêde ew nêzîkî giyan, raz û hebûnê ye. Jixwe koka meseleyê ew e! Ji bilî dayik û bajarê meriv, kesek rondikên meriv paqij nake

"Dem û Hebûn" kilama bêdawî dibêje. Qehremanê me li ser hespê beza dibezîne heta ku şevreş wî ji xewna şêrîn hişyar dike. Ew li dora xwe doş dibe lê tenê rastî bêhêvîtiyê tê. Piştî vê têkçûnê, êdî kilam wekî şewqekê di tarîtiyê de dimîne.

Film: Dem û Hebûn, 2014.
Dem: 14 xulek.
Senaryonivîs û derhîner: Firat Yavuz

Xwarnên Kurdan Li Elmaniyayê Dibin Yên Tirkan.. Nangoş Wek Mînak

We şaş nebihîst; tu Alman peyva "lahmacûn / nangoşt" yan jî "patîle" nizane. Tev de dibêjin: "Ji kerema xwe re pîzayeke Tirkan bide!" Berê ku ez werim ser çîroka "lahmacun û Turkische Pizza" dixwazim ku em bi hev re derkevin û hinek li xwaringeh yan jî îmbîs û restorantan bigerin.

Hema bigire piraniya "çêştgehên gero" û restorantên li bajarên Almanyayê di destên kurdan de ne. Piran navên kurdî li çêştgehên gero kirine. Ango dema mirov ji kolanê ve lê dinêre; dibîne ku li ser serderên wan navên wek: Dîlan, Zozan, Azadî, Serhed, Amed, Mîdyad, Urfa, Gimgim, îsot, û Serkeftin yan jî restorant nivîsîne. Lê li hundir?.. Qet nepirsin!...

Çend caran hat serê min, lê ez ê tenê behsa îmbîskê bikim. Li der navê Kurdî bi rengên kesk, sor û zer nivîsîne. Ji ber ku reng jî rengê kurdan bû, ez bi kêfxweşî ketim hundir. Li hundir bi carê ve rastê cihan û rêbayeke din hatim. Muzîka Tirkî, û yê li pişt pêşxanê bi bişirîneke çêkirî bi Tirkiyeke qaşo nazikirî yan jî qirpandî got: "Buyrun Abê!" Min bi almanî bersiva wî de: "Ich bin kein Abê!" Camêr hinek sor û morê hev bû û bi awirekî gumandagirtî li min nêrî. Min li lîsteya xwerinên wan nêrî: Îzmir Kofte, Menemen, Adana, Îstanbûl izgara, Turkische Pizza... Ez di wir de sekinîm û min bi qestî bi almanî pirsî: "Ev 'Turkische Pizza' çi ye?"

Camêr lehmacûn rakir, nîşanê min da û got: 'Ev e.'

Min dest bi kurdî kir û got: "Va mîrata li welêt 'nangoşt û lahm bi ecin' bû, li Stenbolê bû 'lahmacun' ev ziqûm ji kengê ve bûye 'Turkîsche Pizza?' Camêr matmayî li min nêrî, bersiva min neda. Min gotina xwe domand: "Min ji kolanê ve li dikana we nêrî, dît ku nav û reng kurdî ye, min jî xwest ez bi guhdarîkirina muzîka kurdî xwarineke kurdî bixwim. Lê tişteke din derket pêş min. Ya baş ew e, ez herim, li restoranteke kurdî bigerim!"

Camêr hema bi kurdî ez bersivandim: "Keko em jî kurd in, ev der cihê kar e! Lema me jî wisa kiriye!" Min pirseke din lê werkir: "Tirk tên di vê restoranta we de nan dixwin?" Serê xwe kir ber xwe û got: "Na, ew diçin restorantên Tirkan!" Min bi hêrs lê vegerand: "Wê çaxê ev xwarinên nav Tirkî, muzîka Tirkî, ev pêşwazîkirina bi Tirkî ji bo kê ye?" Deng hat birîn, sor û morê hev bû.

Min ji wî re got: "Nav û rengê we ji derve ve bi kurdî lê hundirê we Tirkî ye. Ez ji mirovên der û hundirê wan ne yek bin, hez nakim û nanê wan naxwim. Ya baş ew e, ez biçim restoranteke Tirkan, qet nebe, der û hundirê wan yek e. Ez dizanim, ez çûme ku û li ku me!" Her gel navê xwe li restorant û îmbîsên xwe dikin û hundirê wan kargehan jî bi reng, ziman û ananeyên welatên xwe dixemilinin. Tenê kurd navên kurdî li restorantên xwe dikin, lê hundir Tirkî ye. Di salên nodî de li Berlînê kurdekî Rojhilat bi navê "Kurdistan" restorantek vekiribû. Her tiştê wê bi kurdî bû. Ew restorant her saetê tijî bû. Lew re almanan digot: "Em carê jî li ba kurdan nan bixwin, ka xwarinên wan çawa ne!" Lê îmbîsên li kêlekên wê, nav kurdî hundir Tirkî vik û vala bûn.

Niha em werin mijara lahmacûnan, lahmacûn xwarineke derdora Dîlok û Rihayê ye. Kurdan ew anîn Stenbolê. Lê ji ber qedexeyê nedikarîn navê kurdî "Nangoşt /patîle" bikarbînin, ji wê "Lehm bi ecina" erebî Tirkîze kirin û kirin "lahmacûn". Heta Îbrahîm Tatlises li ser vê fîlmekê jî çekiribû. Yên ev lahmacûn anî Almanyayê jî dîsa kurd bûn. Di salên nodî de navê wê lahmacûn bû. Lê bi carê ve li her derê navê wê bû "Turkîsche Pizza!" Kî ev kir? Ev çawa bû?

Nizanim. Lê baş tê zanîn ku gelek xwarin ne yên Tirkan in, yên gelên Anatolyayê ne, mixabin ku li cihanê tev de wekî xwarinên Tirkî tên nasandin û zanîn.

Hûn şalvar dizanin, heke di salên pêncî û şêstî de yekî ew li xwe bikira, sosyeta Tirk pê henekê xwe dikir. Lê baş tê zanîn ku di wê germa havînê de lixwekirina herî bijûn e. Dama mirov bi rê ve diçe, navrana wê hewa dide nava şeqê mirovan, nahêle ku mirov bişeliqe. Hûn bawer bikin çawa lahmacûn li Almanyayê bû "Turkische Pîzza" eger Tirkan ew şalvarê me baniya Almanyayê, dê almana bigota: "Turkische Hose mit Arschventilator!" (şalê Tirkan ê bi baweşîna paşiyê)

Wekî encam: Birêzan yan navên kurdî li cihê kargehên xwe nekin, yan jî we lêkir jî, bila navê xwarinên we, muzîka we, dekorasyona we, pêşwazîkirina we jî bi kurdî be. Niha hûn ji çiyê xwe ditirsin? Baş tê zanîn ku dema restorantên Tirkan hebin, Tirk nayên di restorantên nav kurdî de nan naxwin. Alman jî bi vê rewşê dikenin û gelek caran ji me sebebên vê dipirsin. Dema we navên kurdî li zarokên xwe kir jî, bi zarokên xwe re bi kurdî biaxivin, bila zarokên we jî nebin "Turkische Pizza". Ango bila der û hundirê we yek be.

Fêrgîn Melîka Aykoç

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Helbestin Bijartî.. Ebûdê Mexso

Navê wî "Ebdilmecîd e" ku bi Ebûd tê naskirin, kurê Qasim kurê Silêman kurê Hisênê Mexso ye. Di sala 1966'an de li gundê Dawidiyê jidayik bûye, ku ev Dawidiyê dikeve devera Çaxirbazar bi ser herêma Amûdê ve ye.

BAJARO

Xewn e yan rastiyek e
Bajarek li ezmanan difire
Bi xeml e bi girr e
Bi av û kaş e
Her kes lê dinêre
Ji xaka te
Keviran xwîn pijiqand
Hin bi tîqetîq
Bi werimandin û qurnazî
Pişt girêdan bi xeyalan
Hin jî
Xwîn ji çavan diherikin

Dil volkan e,volkan
Çavê welatê min bajaro!
Li ber xwe bide
Hêdî hêdî
Cih û warê xwe bigire
Di nav stêrkên taybet de
Tîrêjan bide
Bila her kes ji tere limêj bike
Bibe mizgefta mirovahiyê
Bibe dibistana rûmetê
Debêje
Kê tu firandî?
Mebêje Arîn... Mebêje
Baskan li hev bixe
Weke xumxuma pêlên derya-yan
Hêlînan di nav dilan de çêke
Li ba warê pêxemberan
Bibe nîşana sedsaliya bîst û yekê
Tîrêj e...
mizgîn e...
Bi koka sor
Gerdûn xwe ji te re bitewîne
Ûbi navê te sûnd bixwe
Bajaro

LAT Û MIRÎN

Hey mirin.....
Xwe neyne xewna min...
Ez li te digerim
Lê bi mêranî...
Tu û jiyan!
Bi hev re heval
Ji bîr meke kevirê ber serê min
Lat û hîmê min...rewşa min
Evînê distra li nav bexçeyê te
Bexçeyê rengareng
Bê fêkî û dan
Hey lat...!
Hêza min .....dîroka min
Tu û dem
Bi kêferat
Koçber dibin
Tenê
Mirina bi lehengî
Mirina bê mirin
Bîranîna min

ŞEHÎD MEMO

Ez çiqas pesnê te bidim
Mezin û giran û jîn e

Pênûs ji destan baz dide
Xwe li xemla te nabîne

Çiya bi axînê hejî
Bejnê li ber ditewîne

Ezman dîl û melûl bû
Mij û moranê dişîne

Buhara min bi te xweş bû
Berxwedanê didomîne

Şagirtê Mezlûm û Egîd
Herekolê dixemlîne

Pilingê çiya ye Memo
Hezaran li pey xwe tîne

Emer nîşan û bira ye
Tîna agir bi cî tîne

Soza didin serok Apo
Dara jiyanê biçîne

Tu Memo yî çiya Zîn e
Welat ji te divê xwîn e

We da qelenek pir buha
Gula azadiyê tîne
10.01.2013

**Xwendina seretayî li gundê xwe û Bîrziravê xwendiye û ya navîn li bajarê Hesekê û Qamişlo. Piştî Bekelorya Peymangeha Amadekirina Maosteyan xwendiye.
Di çend kovar û rojnameyên Kurdî de jî weke rojnemeya Rêkeftin û Ronahî û hinin dîtir helbest û gotar nivîsandine.**

MEZLÛM DOXAN

Sitembar şêrê zindan
Rojek nû ye li cîhan
Tu şehîdê Kurdistan
Şêr şêr e Mezlûm Doxan

Rêberê şana karker
Canê ciwan daye der
Bi ramanê dike şer
Şêr şêr e Mezlûm Doxan



Go berxwedan jiyan e
Dibistana gelan e
Han da keç û xortan e
Şêr şêr e Mezlûm Doxan

Tu bingeh û hebûn e
Doza te serxwebûn e
Peyv bi peyvê dihûne
Şêr şêr e Mezlûm Doxan

Ferhad, Xeyrî û Kemal
Destek xame destek al
Ta mirinê rêheval
Şêr şêr e Mezlûm Doxan

Sakîne, Akif, Elî
Canfîdayên vî gelî
Roka cîhan bû belî
Şêr şêr e Mezlûm Doxan

VEJÎN

Ji dilê welatê min
Çavkaniyek şêlû
Bi pelqe pelq û kelandin
Avek zelal xwe rû da
Ji tîna agirê dilê dayikê
Ji evîna çavên evîndaran
Ji kalên xwe spartin latan
Hêviya zarokên belengaz
Şitlek biçûk
Sîk da cîhanê
Ji agirê dilê Fîsê
Bi ramanek hemdemî
Sîsika mirovan
Xakê diqelêşe
Geh çilmisî
Geh vebû
Dilopên sor çend gîsin kirin
Bûn nîşana dîrokê
Dengê ewran
Hem tav û birûsk
Bahozeke dijwar
Tisonamî
Erdhejek bi volkan
Têlên badayî û zingar
Sînor diber xwe re birin
Ji çavên welatê min
Zingezinga mizgînê
Li guhê min dixist
Ji dengê Heqî û Xelîlan
Ji banga Kemal û Delîlan
Lîsk û pîlan ji hev ketin
Bi xwe ketin
Tîrêjên şeveqê
Ronî dan û belav bûn
Evîn gihandin gerdûn
Ol û netew
Bi hev şa bûn
Sîsika şitlê
Bû hebûn
Bi vîn û evîna mirovan
Bi hemî reng û neqşan
Bi xwîna sor
Ji her alî
Gul vebûn
Bilind, bilind bûn
Mezin, mezin bûn

DÎNO

Dînê li çol û bêla
Bi dest xame dike cot

Go datînim helbestan
Li ser kesên xwe firot

Kesên bê vîn û evîn
Wekî xara kerimkot

Gel avêtin mazatan
Çend dolar, çend benqenot

Welat lîska pera ye
Li ser xakê dikin cot

Roka cîhan bû belî
Şêr şêr e Mezlûm Doxan

VEJÎN

Ji dilê welatê min
Çavkaniyek şêlû
Bi pelqe pelq û kelandin
Avek zelal xwe rû da
Ji tîna agirê dilê dayikê
Ji evîna çavên evîndaran
Ji kalên xwe spartin latan
Hêviya zarokên belengaz
Şitlek biçûk
Sîk da cîhanê
Ji agirê dilê Fîsê
Bi ramanek hemdemî
Sîsika mirovan
Xakê diqelêşe
Geh çilmisî
Geh vebû
Dilopên sor çend gîsin kirin
Bûn nîşana dîrokê
Dengê ewran
Hem tav û birûsk
Bahozeke dijwar
Tisonamî
Erdhejek bi volkan
Têlên badayî û zingar
Sînor diber xwe re birin
Ji çavên welatê min
Zingezinga mizgînê
Li guhê min dixist
Ji dengê Heqî û Xelîlan
Ji banga Kemal û Delîlan
Lîsk û pîlan ji hev ketin
Bi xwe ketin
Tîrêjên şeveqê
Ronî dan û belav bûn
Evîn gihandin gerdûn
Ol û netew
Bi hev şa bûn
Sîsika şitlê
Bû hebûn
Bi vîn û evîna mirovan
Bi hemî reng û neqşan
Bi xwîna sor
Ji her alî
Gul vebûn
Bilind, bilind bûn
Mezin, mezin bûn

Kozik ji para min in
Dawet û dîlan û mot

Tu sivik û erzan î
Ji min giranî û sot

Wek welat pir buha me
Zelal im, ne ava şot

Li meydanê piratîk
Ne wek hinan hote hot

Zuha bûme ji derdan
Guvaştin û pûç û dot

Zivir, zingar wê hilê
Azad bijî bo we got
05. 05. 1986

Ebûdê Mexso pir girîngî daye nirxên welatparêzî, milletperwerî û têkoşîna li hember sitemkarî û zordestiyê, di gel dîrok, xaknîgarî û nasnameya millet û welatê xwe û tiştê balkêş ewe yê ku ji hemiyan pîroztir û girantir,rûmeteke bê hempa daye xwîna şehîdan.

QEDERÊ

Eger tu qeder bî
Ez ê te qet qet bikim
Perçe perçe
Bergeh bikim
Piço piço
Bi nameya pêxemberan
Bi lingê bazekî ve
Girê dim
Bi zingezing
Bê deng bikim
Li ezmanê cîhanê
Di nav ewrên tarî de
Li binê derya Reş û Spî
Li sîngê sêgoşa

Volkana Permoda
Te bavêjim, gemgem bikim
Di mengena rûreşyê de
Li devê masiyekî dev ji hev
Yan jî gurekî birçî
Çav li rê ye
Hûr hûr bikim
Ger wa nebe
Di nav berfa Sîpîrya de
Te veşêrim
Bi kirasê şal û qedîfe
Te zemzem bikim
Bîranînek temenî
Carek tenê
Bi çermê rûspiyan
Germbûna yekîtiyê
Bimeyzîne

Hilmekê li mejî bixîne
Vê qederê
Ji ser xwe hilîne
Lo hilweşîne!
Vê buxçikê bi şewat
Li ser te qederê
Çek çek bikim

Îmralî

Erê Îmralî
Bila li ser te bilîzin
balefir û natorên demê
Bila biguvêşin
Ramanên aştî û demokrasiyê
Bila stewr bikin
Ewrên xwe yên reş û tarî
Bila hênik bikin

Volkana bi kîn
Bila me bigrînin
Xwe bi kenînin bila .....bila....
Lê mexabin...
xemgîn mebin
Hevalnooooo!

Ev e Apo...Apê we...Apê min,
Cîhan tev li hev kir
Gerînekê xwe fireh kir
Baz bê cî man...!
Ne li erd
Ne li ezman
Noker şabûn
Hêviya pakrewanên Amed
Xwe nexemiland
Gelo!
Tu û zindan!
Serok û zindan!
Lê ...qêrîn bi zindanê ket
Bi dîtina te
Dîwar çiriyan

Piç jê herifîn
Ji xwe pirsî
Çi erdheje çi dîlbûne!?
Deriyên hesin xwe tewandin,
Li ber te û dibêjin
Wêneyê te
ser sînga min tê dîtin
Ramana te
Ser serê min hat nîvisandin
Pênûsa te
Kilîta dilê min
Serokê min... serokê min
Çi bikim ez!
Hey dîroka rûpel reş û qirêj
Xwe ji min biparêze

Dil disoje
Çog diricifin
Mû gij dibin
Ev ne qedere hevalno!
Rûpelê qederê diqetînim
Aştîxwaz im, aştîxwaz im...
Heger wa bimîne rewş
Tenê bangek ji Îmralî
Tenê bangek ji Îmralî

ŞOREŞ ZİMAN E

Şoreş ziman e
Ziman jiyan e
Rindik û xweş e
Nasa gelan e

Ziman tu can î
Can tu ziman î

Bi kok Arî ye
Bedirxanî ye
Mîtan û Medya
Dîrok daniye

Ziman tu can î
Can tu ziman î

Kirasê kevnar
Bi cî û bi war
Hebûna Kurd e
Ez jêr' bûme yar

Ziman tu can î
Can tu ziman î

Xweş û hêja ye
Dilê dila ye
Pir pir buha ye
Hîmê Kruda ye

Ziman tu can î
Can tu ziman î

Tîpên zêrîn î
Sivik û vîn î
Şêrîn û hingiv
Xweşik û jîn î

Ziman tu can î
Can tu ziman î

Bi kêferat î
Neqşa welat î
Gula şilêr e
Çi lihevhatî

Ziman tu can î
Can tu ziman î

Zarav û reng e
Zengîn bi deng e
Sorî, Zazî ye
Şoreş û ceng e

Ziman tu can î
Can tu ziman î

helbestvanê me jiyaneke nuh hêvî kiriye bi vî tovê ku hatiye çandin. Lewra nihaka havil û berhemên rengereng dide. Her wiha hezkirina zimên li cem wî cîhekî layiq û darîçav girtiye, ji ber dîtiye ku zimanê Kurdî zimanê dayikê bi sedê salan hatiye qedexekirin.